

Artsax yan Qerebax,
kîjan xwedî maf e?

»»» R:7



Nivîskarî û
Xwekuştin

»»» R:4



Covîd-19 bi
tenê ne sebeb e

»»» R:6



Lêvegera kurdî
û destpêkirina ji
sifir

»»» R:8



*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasetî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (383) 08-10-2020 Buha (1000) Tûmen

Xelaya serdema Qacariyan vegeyriyaye

Di navbera salên 1296 heta 1298-an de, anku di serdema Qacariyan de ku hev-dem digel şerê cihanî yê yekem bû, xelayeke ecêb di deverên di bin desthilata Qacariyan de peyda bû, ku gelek caran wekî holokaştê Îranê hatiye binavkirin.

Herçiqas ku heta niha ti amareke seraşt ji hejmara qurbanî û miri-yên wan du salan ji ber dest nîne, û bi tenê pêka hindê ji gotinên ku berê dane zanîn, nêzî %50 a xelkê Îranê wê demê canê xwe ji dest dabûn, lê ya ku diroka hevdem a Îranê bas jê kiriye, hejmarek sedem bi hev re ew tirajîdiya mirovî afirandin ku yên girîng ji “şerê cihanî, xela, hişkesalî, belavbûna çendî nexweşiyên li nav ajel, baxçe û werzêriyê, nexweşiyên Weba, Malariya, An-filoanzaya Îspaniyayî, û şerê tiryak”ê pêk hatibûn, û ji hemûyan girîngtir neşiyên û bêweciya taqimeke deshilar û nebûna bernameyeke dariştî bona birêveberiya welat bû.

Bi vê berçavroniya dirokê, emê bêne ser rewşa niha a Îranê ku piştî zêdetir ji 100 salan ku li ser wan bûy-

eran re derbaz dibe, îro tê dîtin ku Îran û xelkê rûniştî di wê cuxrafiyayê de, rastî heman qederê bûne. Di encam de neşiyaniya deshilarên hakim li ser wê cuxrafiyayê, ti jîndarek di Îranê de hêvî bi sibehiya jî-yaneke birûmet nîne.

Hev-dem digel nexweşiya Koronayê, her wekî berdevkê kabîneya Rûhanî, “Elî Rebi`î” dibêje: “Bi wê sedemê zêdetir ji 1 milyon û 500 hezar kes di Îranê de betal mane”, enfilasiyon (helawsan), gendeliya malî, rewşa xirab a aborî, pîrsgirêkên civakî, û dorpêçên Amerîkayê, welatê Îranê gihandiye pileya du a rojreşiyê di cihanê de.

Pêka pîvera rojreşiyê a cihanî anku “Felaket” ku pêka nirxa giştî ya enflasiyonê û qasa betaliyê tê diyarîkirinê, “Venezuela” bi qasa 79.4 di pileya yekem de ye, û Îran bi qasî 61.6 di pileya duyemîn û di rêzbenda wê pîverê de li ser asta cihanê bo xwe misoger kirine.

Eva jî di demê de ye ku li 12-ê Rezber a îsal de, Serkomarê Îranê, “Hesen Rûhanî”

di gotineke xwe de ragihandibû ku rewşa aboriya Îranê li çav aboriya Almaniyayê, gelek pêşketîr û geşetir e! Lê wekî xelk di nav bajaran de bi tewahî seh dîkin ku roj bi roj rewşa jiyanê bi taybet ji aliyê aborî, jî-yan û derbaskirinê ve, xirab û xirabtir dibe û baştir nabe.

Hev-dem digel wê rewşê, tê dîtin ku tevî direv û çewtekariyan û sozên bê binge



yên rejîmê bona baştirkirina rewşa jiyanê xelkê, rejîma Îranê di cihê vê de ku hewl bide dijatiya hevalbendên cihanî û deverî li dijî xwe kêmbike, û dostatiyê digel yên din bike rêvea karûbarê xwe, lê jiber ku berdeyam e li ser dijatîkirinê û hewldan

bo jinavbirina yên din, lewra dem bi dem, givaşên navnetewî zêdetir dibin. Nûnerê Taybet yê Amerîka bo karûbarê Îranê, “Elliott Abrams” di hevpeyvînekê digel “CNN”ê de ragihaniye: “Amerîka wê di roj û heftiyên bê de, li dijî Tehranê givaşên xwe zêdetir bike, û ya ku heta niha me li ser Îranê cîbicî kiriye, digel givaşên bê de, nayêne hevberkirin. Hev-dem Wezîrê Ber-

pêk bînin.

Ew du mînak ji givaşên derveyî, dema ku tene tenişt givaşên navxweyî û nerizay-etî û pîrsgirêkên ku li ser hev bûnî kelek, vê yekê didin xuyakirin, ku temenê Komara Îslamî wekî deshilatên narewa yên pêş xwe ber bi dawiyê ve diçe. Bi çavxişandineke lezgîn û kurt li ser rewşa perîşan a aborî di navxwe ya Îranê û bilindbûna dem bi dem û lezgîn a nîrxên hewcehiyên jiyanê, bi taybet xwarinan û hejartirbûna xelkê, û bilindbûna asta hejarî, betalî û enflasiyonê, wê rastîyê rohtir nîşanî me dide ku rejîma Îranê di rewşa vegeyriyê bo paşve ye.

Vegerîna Îranê bo serdema Qacar û hatina şîpeleke nû ji xelayê di paşerojeke nêz de, û nebûna tu pilanekê bona rûbirûbûna digel pîrsgirêkan ji aliyê rejîma Îranê ve, wisa kiriye ku mirov nikare cudatiyeke wiha di navbera sala 1298-an digel sala 1399-an de danê, tenê cudatiyek ku hebe di hejmaran de ye, neku rewşa jiyanê her ew rewş e, û deshilatê bêwec û kêrnehatî her ew deshilat e.

Sergotar

Kîjan Îran?

N: Kerîm Perwîzî

Di wan rojên derbasbûyî de, Riza Pehlewî dawî kurê Şahê Îran ku hikûmeta wan ji aliyê şoreşa gelan ve hate hilûşandin, peyamek daye ku gotina dixawze hemû hêzên siyasî li jêr çetrekê bi navê peymanê nû kom bike.

Di wê peyamê de ku Riza Pehlewî daye, zêdetir li gotareke giştî ya kovar yan jî malperekê diçe ku bi hindik peyv û rîsteyên wêjeyî hatibe nivîsîn, ne wek peyameke siyasî a rasteqîne ku dest danê ser pîrsgirêkên sereke û nîşandana çareserkirina rasteqîne ya pîrsgirêkan be!

Di her peyameke siyasî ya wiha de girîngtirîn beş pêk hatiye ji wan dûredîmenan ku ji paşerojekê nîşan dide, û xelkê bo wê paşerojê han didî, ku hevkar bin; Di wê peyama Rizayê Pehlewî de jî naveroka mijarê pêk hatiye ji wê beşê ku dibêje hêzên siyasî hêl û xetekê danên di navbera xwe û Komara Îslamî de, ku gelo aliyê Komara Îslamî ne, yan aliyê Îranê? Dibêje hêzên siyasî dibe bo rizgarkirina Îranê kom bibin!

Rizgarkirina Îranê, di peyv û rîstebendî de belkî tişteke biçirûk û birîqedar bête ber çav, lê dema ku wekî peyameke siyasî tu mêzyî hûrdekariyên wê siloganê dikî, pîrsyarên zêde bo te têne pêş. Girîngtirîn pîrsyar eva ye ku tu bi kîjan dîdgehê çav li Îranê dikî? An jî bi wateyek din, mebesa te kîjan Îran e?

Dema xwe Rizaxanê Mîrpenc, bapîrê her wî Rizayê Pehlewî, di danûstandineke “Mehruse” ya Qacariyan de, Îranek diruşt kir ku tê de

Peyama sersaxî û hevxiemî ya PDKÎ bi boneya koçda dawî ya “Babe Şêx” serokê Civata Ruhaniyên Êzidiyan



Lêpirsyarê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê, Mîstefa Hicrî, bi boneya koçda dawî ya “Babe Şêx” serokê Civata Ruhaniyên Êzidiyan û kesayetiyekî diyar û nîştimanperwer ê Kurdiştanê, peyama sersaxî û hevxiemiya xwe û PDKÎ, arasteyê Êzidiyan kir.

Deqa peyamê wiha ye:

Derheq koça dawî ya “Babe Şêx” serokê Civata Ruhaniyên Êzidî

Rêzdar Şêx Mîr û birêzan Civata Ruhaniyên Êzidî

Derheqê koça dawî ya Babe Şêx bavê ruhî yê Êzidiyan, û kesayetiyê diyar û welatparêz ê Kurdiştanê, ez sersaxî û hevxiemiya xwe û PDKÎ bi we rêzdarî, û hemû xûşk û birayên Êzidî radigehînim.

Ruha Babe Şêx şad şad, û yad û navê wî, bi nemirî bimîne.

Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê

Lêpirsyarê Giştî

Mîstefa Hicrî

02.10.2020

hewla reşkirina hemû neteweyan da, û bi postalê artêşa Rizaxan tev dever dagîr kirin, û xwaştin Îranêke yeknetewe diruşt bikin ku hemû kes tê de Îranî bin, û bi Farsî biaxivin!

Piştî Xumêynî hat û Îrana Pehlewî ku wî jê re digot Îrana Taxûtî, biguhere bo Îrana Îslamî, ku tê de “Weliyê Feqîh” biryar dide, û tev “umeta wahîd” ya Îslamiya Îranê guh bi fermana wî dibin.

Nikarî basa Îranêke xeyalî bikî, û heqîqetên nav Îranê nebînî, û Kurd û Tirk û Belûç û Ereb û Tirkemen li dervey bazineya Fars de bin, û bi “Esalet” a Fars û vêdedana (Eqwam û Qebayil), Îranekê diruşt bikî ku hemû destê hevpeymaniya digel dawî kurê Paşayê herifî yê Îranê biguşînin!

Xebata li dijî Komara Îslamî di nav neteweyên Îranê de, li ser peyama Rizayê Pehlewî nehatiye rawestandin ku hekî em guhdarê wî nebin, êdî xebat wêran dibe, û nagihîjine hêviyê, belkî eva ew û ewên din in ku bi rohnî dibe bêjin ku mebesta wan kîjan Îran e, da ku em bizanin em xwe di wê xewnê de dibînin an ne? Îrana yek neteweyî bi mafeke biçûk a bajarvanî ve, yan Îranek ku pêk hatiye ji bihevrebûna dilxwazane ya hemû neteweyan? Dibe hêla xwe diyarî bikin û bizanin em li kîjan aliyê hêlê ne, berdewamiya şovênîzim yan bawerî bi wekhevî û yeksaniya neteweyan di Îranê de?

Navenda Siyasî a PDKÎ derheq “Pêymanê Nowîn” a Şahzade Riza Pehlewî daxuyaniyek belav kir

Navenda Siyasî ya PDKÎ derheq “Pêymanê Nowîn” a Reza Pehlewî daxuyaniyek belav kir, di beşeke wê daxuyanê de hatiye: “Pêymanê Nowîn jî wekî piraniya bername û helwîstên hêzên opozîsiyona seranserî raştîyên civatgeha Îranê nedîde girtine”.

Deqa daxuyaniyê wiha ye: Derheq “Pêymanê Nowîn” ya Riza Pehlewî

Roja 7ê Rezber a 1399an, (28ê September 2020), Riza Pehlewî bi rêya vîdiyoyekê ve peyameke nû bi navê (Pêymanê Nowîn) an ku girêbesta nû belav kir. Navbirî di gotinên xwe de bi kurtî îşare bi wê raştîyên ku Komara Îslamî di 42 salan de bilî dîktatorî, serkut, teror, dizî, gendelî û hejarî û...hwd, ti deskevteke bo xelkê Îranê tinebûye û daxwaz dike ku tev xelkê Îranê yek bigrin, nerizayetiyan û mangirtinan lidar bixin û bi hev re bona jinavbirina Komara Îslamî û avakirina sistemekî demokratîk di Îranê de têkoşanê bikin.

Çend kanalên televîzyonî yên farsîziman jî ku piştewanî ji “Pêymanê Nowîn” dikin bi hûrî banghêjiyê bo dikin û hewl didin “Pêymanê Nowîn” wekî bernameyekî nû û heta wekî “manîfêstek”ê bona rizgariya Îranê bi hizra giştî bidin nasandin.

Lê “Pêymanê Nowîn” jî wekî piraniya bername û helwîstên hêzên Opozîsiyona seranserî, raştîyên civaka Îranê nedîde girtine. Sedema bingeîn ya şikest û serneketina hewlên berê jî her nepejirandina raştîyên berçav yên di civaka Îranê de bûye: Îran wekî welatekî çend netewî, çend zimanî û çend olî ye û her-çiqas ku înkara wan jî bikin, çî ji raştîyê nayê guherîn. Bernameyekî siyasî ew dem dikare piraniya xelkê li dewra xwe kom bike ku bo Îranekê be ku raştîyên civaka Îranê berçav bigre, neku sexte û îdolojîk be. Mebesta Riza Pehlewî û

hevhezrên wî ji azadî, demokrasî û mafê mirov bo Îranekê ye ku înkara hebûn û nasnameya zêdetir ji nivîya nifûsa xwe dike, zêdetir ji nivîya zarokên wê nifûsê ji seretayîtirîn mafê mirov an ku perwerde û hînkari bi zimanê dayîkê û mafên siyasî û çandiyên xwe tene bêparkirin û...hwd. Îrana yek netew yek ziman yek çand tenê di xeyal û îdolojiyeke radikalî de heye.

Berdengê “Pêymanê Nowîn” a Reza Pehlewî, xelkê Tehran, Şîraz, Meşhed û bajarên Farsnişînên din yên Îranê ne, nek netewên jêr zilmê de. Lewma “Pêymanê Nowîn” zêdetir wekî hêvî û xweziyekê ye heta bernameyeke siyasî ya realîstî ku bikare bibe binyatek bona çareserkirina siyasî ya pirsgrîkên siyasî yên neteweyên ne Fars.

Riza Pehlewî li ser mijara pirsên gelan di Îranê de bê alî nîne û bi bîr û bawer beşek ji wî aliyê hizrî ye ku îtiraf bi nasnameya gelên ne Fars û selimandina mafên siyasî bi nateba û neguncaw digel berjewendî û yekparçeyiya axa Îranê dizanin.

Navbirî di meha March a sala 2019an de di hevpeyvînekê de ragihandibû ku “ew ji mentîqa xwendin bi zînamê dayîkê ti fam nake”.

42 sal e em wekî Kurd her roj dîktatorî, serkut, teror û cudatîdanîna Komara Îslamî bi hemû awayekî bi rih û can êş û azara wê seh dikin, heyamê 42 salan e ku gelê kurd bi kirayar, bi dijî zulim û zora bêsînora rejîmê rawestiyaye. Lê armanca me ya dawî bi tenê hirifandina rejîma Îslamî nîne, belkî armanca me dabînkirina maf û azadî bo gelê Kurd di Îraneke demokratîk û federal de ye.

Em bona hirifandina Komara Îslamî xebatê dikin û amade ne ku qurbanîyê jî li ser bidin, ji ber wê yekê ku em rejîmê bi lempêr li ser rêya dabînkirina maf û azadiya xwe dizanin.

PDKÎ zaf caran ragihandiye ku deriyê diyalogê bo gihîştin bi jihevtêgihîştin û jihevnêzîkbûna



Opozîsiyona Îranê vekiriye û yekgirtin û pêkanîna alternativeke demokratîk û hemûalî seba hirifandina Komara Îslamî û cihgîrkirina sistemeke azad bi hewcehiyek pêwîst bo îroya Îranê dizane. Lê hevdem û pêka mentîqê, em hevkarî û piştewaniya hêzekê dikin ku bi rohnî û dîr ji “Generalities” an ku giştîgotinan, ji me re bibêje hekî di paşerojê de piştî hirifandina rejîma Îranê bi alîkarî û piştewaniya me deshilata di Tehranê de kete destê, dê çî bo me biguhere? Maf û azadiya me dipejirîne û dawî bi serkut û cudatîdanîn û bêparkirinan tîne? Derheq gelên nefars, hikûmeta piştî Komara îslamî di binyatê de dê çî cudatiyekê digel rejîma niha hebe?

Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê
Navenda Siyasî

6ê Çirriya Pêşîn a 2020an
15ê Rezber a 1399an

Nivîskarî û Xwekuştin

N: Occo Mahabad

Di dîrokê de gellek kes û nivîskar hene ku xwe kuştine. Her xwekuştin sedemên cuda dihewîne. Di vê çalakî û biryara kesane de mirov di tûrika jiyana xwe de gellek raz û heştên tevlihev û nefambar vedişêrin. Em nikarin mijara xwekuştinê bi pêşdarazên beredayî mehkûm bikin. Divê baş bê fêmkirin ku nakokî û aloziyên heyî yên jiyanê xwe bi siya mirinê ve nîşanî civatê didin. Loma pirsra “Gelo çima xwe kuşt?” piştî mirinê giringiyê nade wate û sedemê. Hûn raşt bibînin an jî nebînin her xwekuştin ji sedî sed mijareke şexsî ye ku li gorî mantalîte û hebûna xwe sedemên rewa û mafdar dihewîne. Mirin û xwekuştin, jin, mêr, zarok, netew nas nakin.

Ramyar û filozofên serdema pêşîn û nûjen di vê diyarde û bûyera girîng de cuda fikirîne û tevgeriyane.

Sokrat canê mirovan milk û sermiyana Xwedayan dibîne lewma ne alîgirê xwekuştinê ye lê dibêje ger mirov mecbûr bimîne xwekuştin ferz e.

Eflatun jî wekî Sokrat întixarê rê û rêbazeke raşt nabîne, taswîp nake ji xêncî sedemên mecbûrî.

Arîsto bi temamî li dijî xwekuştinê derdikeve. Întixarê karê hemwelatîyên bêkêr û xerab dibîne û rave dike. Li gorî Arîsto jiyan diyariyeke mezin e ku ji me re hatiye dayîn divê qedr û qîmeta wê bê zanîn. Întixarê wek emelê ehmaqan şîrove dike. Arîsto arîstokratekî ye alîgirê hêz-daran e. Bi dîtina wî, mirina xelkê feqîr û reben girîng nîne.

Epikuros ger mirov bextreş û bêsiûd be dikare bi mafdarî xwe bikuje, lewma xwekuştin çalakiyeke rewa dibîne. Li gorî wî her mirov azad e ku xwe bikuje. Epikuros giringiyê dide azadiya fikr û

ramanên mirovan.

Cicero ji ber sedemên olî û civakî li dijî xwekuştinê disekine.

Platonparêzên nû yên wekî “Pythagoras”, “Plotinos û Porphyrios” jî li dijî xwekuştinê derdikevin.

Seneca: Heke mirov zaf kal be û zewqa jiyanê nemabe, ew xwekuştinê rêyeke mafdar teswîr dike.

Albert Camus bi hêrs dipirse: “Gelo jiyan tişteki ewqas watedar e ku mirov bijî? Wate nemîneçîrok û serpêhatiya mirinê dest pê dike.” Lewma di hişê “Camus” de xwekuştin mijareke pêwîst û watedar e.

“Nietzsche” xwekuştinê erênî dibîne û dibêje: “Mirov heyîneke xurt nîne, jiyan her roj lawaziyê bi bêhêvîtiyê ve derdixe pêşberî me. Ji ber vê carinan çalakiya herî mezin, esîl û şanaz xwekuştin e. Întiharê biryara kesên azad qebûl dike.

“Schopenhauer” jiyanê tişteki erjeng dibîne, xwekuştinê bi dildarî dipejirîne. Bi fikra wî ev civat bi dizî, kuştin, şêlandin û bi hezaran xerabiyan cihekî kambax, rezîl û kepaze ye, lewra xwekuştin wek rêya xelasbûnê dipejirîne.

Civaknasên serdema nûjen jî li ser xwekuştinê ji hev cudatir fikirîne û sekinîne.

“Emil Durkheim” xwekuştinê raştiyeke civakî şîrove dike. Li gorî wî kesên ku xwe dikujin êdî bi civatê re li hev nayên bi zanebûn qestî canê xwe dikin. “Durkheim” di xwekuştinê de siya tenêti, bêhêvîti û belengaziyê digere.

“Kant” xwekuştinê naperijîne wekî tişteki şermdêr û kerixîner dibîne.

“Javata” û “Melvin Seeman”, di bingeha xwekuştinê de



biyanîbûna mirov û civatê dibînin. Li gorî wan mirovên modern, belengaz û tenê ne rizgarbûnê di xwekuştinê de digerin.

Li ser xwekuştinê gellek teoriyên psîkolojîk jî hene dixwazim fikrên çend psîkologan binim ziman.

Li gorî “Sigmund Freud” jî bo mirov tiştê herî girîng diyardeya zayendîtiyê ye. “Freud” xwekuştinê wek sadîzmeke rihî îfade dike. Li gorî wî mirovên ku rihê wan birîndar û nexweş dikarin xwe bikujin.

Di teoriya “Erich From” de ajoyên civakî girîng in ne tehnên kesane û zayendî. Li gorî wî her mirov di hundirê civakê de dibe mirov. “From” xwekuştinê pirsgerêkeke civatî qebûl dike û wisa dinirxîne.

“Karl Menninger” xwekuştinê di navbera jiyan û mirinê de wekî şerekî dijwar û jêneger dibîne. Li gorî fikra wî kîjan xurt be ew qezenc dike. Ol û baweriyên modern jî xwekuştinê li gorî xwe rave kirine.

“Ola Îslam”ê xwekuştinê guneheke mezin dibîne bi tekez qedexe dike û giringiyê dide jiyanê mirovan. Lewma rêjeya xwekuştinê li gorî lêkolînên kirî di hundirê Misilmanan de pîr hindik in.

Piştî ferman û nêrînên alim û mirovên dinî yên Augustin, Ola Xaçpareziyê xwekuştinê erênî nake û nasepine. Di serdema kevn ya klasîk de rewş hinekî cudatir e carinan Xaçpêrêstên bawermend ji bo ku ji zordestiyê xwe xelas bikin

mecbûr dimînin bi komî an jî şexsî xwekuştinê dikin. Di roja me de otorîteyên Xirîstîyanî ji xeynî mezheba Proteştanî xwekuştinê gunehekî erjeng dibînin û napejirînin.

Ola Cihûtiyê xwekuştinê wekî olên din yên sereke gunehekî li hemberî Xwedê qebûl dike. Lewma li dijî xwekuştinê disekine. Cihûti jiyanê pîroz dibîne.

Olên wek Hinduîzm, Budîzm û Caynîzim li hemberî xwekuştinê hikmên dijwar negotîne û neanîne ziman. Hema hema em dikarin bibêjin ku rê dane xwekuştinê û teşwîq kirine bi kirinên xwe.

Xwekuştin bi sedan reng, sedem û armancan dikarin derkevin pêşberî me. Lê dive em fêmkirin ku xwekuştin raştiyeke civakî ye û mixabin herdem dê raştî me were.

Dawiya dawî nivîskar jî mirovekî/ê ye dikene, digirî, bedbext an jî bextewar dibe. Hêza nivîskar qelema wî/wê ye. Bi qelem û fikrên xwe pêşengiya civatê dike. Civat fêmkirî ye ew mecbûr e rola xwe ya dîrokî bilîze û bibe neynûk û ûjdana civatê. Di dinyayê de gellek nivîskarên jêhatî bi sedemên bicih xwe kuştine. Ez ê ji xwendevanan re behsa jiyanê çend nivîskarên Kurd û yên Biyanî bikim ku xwe kuştine.

Dema ku behsa xwekuştinê derbas bibe nivîskar û helbestvanê Kurd Şikoyê

»»»» Doma R:4

Hesen tê bîra min. Şikoyê Hesen di sala 1928an de li gundê Camuşvana biçûk ku girêdayî navçeya Axbarana Ermenîstanê ye tê dinyayê. Malbata Şiko piştî şerê cîhana yekemîn ji ber qetliyama dewletê xwe xelas bike mecbur dimîne ji Dîgora Qersê koçî Ermenîstanê dike. Şiko hê pênc salî ye bavê wî Hesenê Mido dimire. Apê wî Sofî lê xwedî dike.

Şiko piştî xwendina xwe ya seretayî, navîn û ya dawî di sala 1948an de diçe zanîngeha Yêrîvanê beşa ziman û zaniştiyê dixwîne. Bi xelaskirina zanîngehê ve di navbera salên 1954 û 1957an de mamoşetîya zimanê Ermenî dike.

Şiko di beşa kurdî ya radyoya Yêrîvanê de deşt bi editoriyê dike û di navbera salên 1959 û 1961'an de jî karê şêwirmendî û wergêriyê dike. Demekê editoriya Radyoya Rewanê dimeşîne. Di sala 1961'an de bi sedema perwerdehiyê diçe Leningrad'ê û ser zimannasiyê doktoraya xwe dike. Di sala 1965'an de di Enstîtuya Gelên Asya û Afrikayê de beşa Kurdolojiyê temam dike.

Helbestên Şiko cara pêşî di rojnameya Zanîngehê de û dûre jî di rojnameya Rêya Teze de tên weşandin û car caran jî li radyoya Kurdî tên xwendin. Şiko dibîne ku dewleta Sovyetê piştî Kurdan digire, her derfetê radixîne pêşî wan, ziman, çand, huner û jiyana Kurdan mezin û bilindtir dike ji ber vê mebestê herdem dibe alîgirê dewleta Sovyetê.

Şairê dildar, qelemhêz û heşiyar Şikoyê Hesen di sala 1976an de xwe dakuje lê hê jî sedema xwekuştina wî ya rasteqîn nayê zanîn. Gora wî li paytexta Gurcîstanê ya bajarê Tîflîsê ye.

Heta mirina Şiko sê heb pirtûkên wî çap dibin. Di sala 1961an de pirtûka Qalçîçek, di sala 1966an de pirtûka

Tembûra Kurda, herî dawî di sala 1970an de Meremê Dilê Kurd. Piştî mirina Şikoyê Hesen bi navê “Perwaza Welat” û “Payîz û Ba” du heb pirtûkên wî çap dibin.

Ez çiqas qala wî şairê zimanhez, helbesthez, fidekar û jêhatî bikim dilê min diêşe. Şiko nivîskarekî wêdetir însanekî ye. Divê xwendevan bizanibin û têbigihîjin ku her xwekuştin çalakiyeke kesane ye û li gorî xwe sedemên rast û mafdar dihevin.

Divê neyê zenkirin ku xwekuştin qelsî an jî bêhêzî ye. Ji ber ku her xwekuştin bi zanebûnî tê kirin û xwestin. Ka ji xwe bipirsin “Gelo çend kes dikare ku xwe bikuje konê xwe bar bike ji vê dinyaya fanî”.

Nivîskarê duyemîn yê Kurd ku xwe kuştîye dixwazim bi we bidim nasandin ew helbestvanê zîrek Mihemed Omer Osman e.

Mihemed Omer Osman di sala 1957an de li taxa Dêrgezên bi ser bajarê Silêmaniye ye tê dinyayê. Dema pola sêşemê dixwend ji ber şerê di navbera Iraq û Îranê xwendina xwe nivî dihele. Di sala 1975an de deşt bi karê nivîsandin û rojnamegeriyê dike. Carinan ji ber sedemên darayî karkeriyê dike.

Helbestên wî ji aliyê ciwanên Kurd ve pirr tê hezkirin. Ji ber helbesta wî ya Generalê Payîzê ku di dîwana wî ya Li Xurbetê cih digirt navê wî wek Generalê Payîzê hat binavkirin.

Di sala 1991an de li Şeqlawayê di Kongreya Yekitiya Nivîskarên Kurd de dibe endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd.

Berhemên wî heta niha di gellek rojname, kovar û malperan de hatin weşandin. Pirtûka wî ya Li Xurbetê di sala 2013an de li Bakur ji aliyê weşanxaneyê Avestayê tê çapkirin.

Ev şairê dilgeş di sala 2019an de mixabin di mala xwe de

xwe darde dike. Mebesta xwekuştina wî ji raya giştî ve tucarî nehat zanîn. Piştî helbestvanên Kurdan divê em hinek jî bala xwe bidin nivîskarên cîhanê.

Gellek nivîskarên cîhanê yên întixar kirine hene wek mînak; Virginia Woolf, Mayakovskî, Walter Benjamin, Sylvia Plath, Cesare Pavese, Stefan Zweig, Jerzy Kosinski û gellek navên din.

Lê ez ê ji we re bi tenê qala du nivîskarên cîhanê bikim ku bandoreke mezin li ser xwendevanên cîhanê hiştine.

Parêzvanê bizava futurizmê nivîskar û şanoger Vladimir Mayakovski di sala 1893yan de li Gurcîstanê ji dayik dibe. Bi saya fikr û ramanên xwişka xwe Bolşevîkan nas dike di 15 saliya xwe de dibe endamê Partiya Qomînîst ya Bolşevîkan. Ji ber çalakî û nêrînên xwe yên Sosyaliştî pirî caran tê girtin û dikeve hepsê.

Piştî damezrandina dewleta Sovyetê ji bo pêşxistin û fêmkirina bizava Futurizmê hewl dide, dixebite, gellek helbest û tekstên şanoyê dinivîsîne.

Doştê wî yê ku jê zehf hez dikir Sergey Yesenin li Leningradê întixar dike. Ev bûyera întixarî dilê wî pirr diêşîne û tesîreke mezin lê dike.

Mayakovski gellek caran ji ber fikrên xwe yên rexneyî tê şermazarkirin lewma ji aliyê nivîskarên din zêde nehatiye hezkirin û qebûlkirin.

Rihê Mayakovski weki zarekî biçûk û delodîn bû. Tucarî ji aliyê derdora xwe ve nehat fêmkirin. Em dikarî bêjin ku ew mirovekî tenê bû.

Vladimir Msyakovski di sala 1930yan de bi çeka xwe ya emegdar xwe dakuje.

Nivîskara duyemin ya biyanî ku jiyana wê zêde zêde bandorker û balkêş e dixwazim hinek behs bikim ku bila xwendevanên me hinekî

binasin. Helbestvan û nivîskara Emerîkî ya zarxweş Sylvia Plath di sala 1832yan de li Massachusettsê ji diya xwe dibe.

Plath helbesta xwe ya pêşî di heşt saliya xwe de dinivîse. Di sala 1940an de bavê wê dimire. Ev mirin jiyana Plath tevlihev û serobino dike.

Piştî mirina bavê wê tê dîtin ku Plath nexweşê psîkiyatrik ya manik depresif e.

Di sala 1950an de li Smith Collegeê dixwaze xwe bikuje lê bi ser nakeve wek birîndar xelas dibe. Demeke kurt ji ber vê bûyera xêrnexwez li tîmarxaneyê dimîne.

Di sala 1955an de li koleja Smith diqedîne. Piştî kolejê zanîngeha Cambridgeê dixwîne û xebatên xwe yên nivîskî li wir didomîne. Gellek helbestên wê di rojnameya Varsity ya zanîngehê de tên weşandin.

Di sala 1956an de bi helbestvanê Înglizî Ted Hughes re dizewice jiyana xwe li Londonê didomîne. Lê ji ber nexweşiya wê ya psîkiyatrîk ya manik depresif zewaca wê zêde dewam nake mîrê xwe berdide jê vediqete bi zarên xwe re bar dike cihekî din maleke kevn û erzan kirê dike.

Di sala 1963yan de ji ber jiyana xwe ya feqîr, belengaz û dijwar zarokên xwe di odeyekê de kilît dike berê xwe dide mitbaxê serê xwe dixê hundirê firinê bi gaza firinê xwe dakuje.

Hûn jî dibînin ku xwekuştin raştiya jiyana cîhana me ye. Helbet gellek sedemên xwekuştinê hene: Sedemên psîkiyatrîk, felsefîk, olî, civakî, îdyolojîk, ekonomîk û yên şexsî.

Sedem her çi bibe jî ev tercîha kesane e. Hûn bûyer û rastîya xwekuştinê qebûl bikin an jî nekin ew ê herdem her roj şopa xwe bi siya mirinê ve derxe pêşberî we.

“Covid-19” bi tenê ne sebeb e!




N: Dara Natiq

Di çend rojên derbasbûyî de, berdevkê hikûmeta Hesen Rûhanî ragehand, ku bi sedema vîrûsa “Covid-19”ê qasî yek milyon û 500 hezar kes di Îranê de tûşî bêkariyê bûne. “Elî Rebi`î” Berdevkê rejîma Îranê herwisa di doma axavtina xwe de got ku zêdeyê yek milyon û 600 hezar derfet û pîşeyên karî tûşî zirar û zîyanê bûne. Navbrî herwisa îşare bi wê yekê kirye ku ew di kêmkirina rêjeya bêkariyê di Îranê de serkevtî bûne û yê bo sala bê qasî 21 hezar milyar tûmenî ji bo çêkirina 350 hezar derfetên karî serf bikin. Ev gotinên Berdevkê hikûmetê di demekî de ye ku Saziya Bername û Bûdceyê di Îranê de ragehandiye ku di heyama 7 salên borî de dewleta “Rûhanî” nekariye rêjeya bêkariyê bike tek reqemî û belkî zêdetir jî bûye.

Di rastî de dewleta “Rûhanî” û damûdezgehên berpirsyar yên welêt di wan çend salên borî de ne tenê nekariye ti pêngavek biçûk ji bo baştirkirina bijîva jiyana hevvelatiyan biavêjin, belkî rewşa jiyana xelkê her roj li berê xirabtir dibe û rêjeya bêkariyê jî çend hind zêdetir bûye. Lê dewleta Rûhanî niha dixwaze ku şikesta rêveberî û rewşa xirab û herifîna aboriya welat bêxe situyê vîrûsa “Covid-19”ê û bi vê hindê raya giştî ya xelkê Îranê bixapîne. eva di halekê de ye ku bilindbûna rêjeya bêkarî a welêt û herifîna aboriya welêt û hejarî û bêhêvîtiya niha a civatgeha Îranê wedigere bo siyasetên şaş û mirovkujane yên rejîmê û herwisa sitratêjiya şaş û

şerxwazane ya rejîmê di asta herêmî û cîhanî û herwisa piştevanîkirina rejîmê ji girûpên terorîst û mudaxilekar di karûbarê welatan û guh nedan ji yasa û rêsayên navdewletî û hewldan bo destpêragihîştin bi çekên “etomî” ku bûye sebebê dorpêçên berfireh yên aborî bo ser wî welatî û jiyana xelkê belengaz yên Îranê.

Di rastî de xelkê belengaz û mafxwarî yên Îranê bi salan e ku bûne qurbaniya siyasetên şerxwazane û şaş yên rejîma Îranê û bi dest bêkarî û hejarî û rewşa xirab a jiyane ve dinalînin. Diyardeya hejarî û bêkariyê di Îranê de ti pêwendiyek bi vîrûsa “Covid-19”ê ve nîne û belkî rasterast girêdayê asta nizim a geşesendina aborî û bitalanbirina saman û heyîya giştî û nemaze çavkaniyên xwazayî, dîktatorî û sîstema gendel a siyasî di welêt de, bilindbûna rêjeya gendelî û dizî û “fesad”î û nebûna ti “şefafiyetek” di asta rêveberiya nîzamê de, herwisa nebûna ti bername û pirojeyekê ji bo çêkirina derfetên karî. Di niha de rewşa jiyana û guzerana xelkê Îranê gelek xirabtir ji dema şerê heşt salî yê di navbera Îranê û Îraqê de. Xelkê Îranê piranî di bin hêla hejariyê de jiyana dîkin. Rêjeya bêkarî û kêmkariyê zêdetir jî %55 a hêza karî di Îranê de bi xwe ve girtiye. %70 a xelkê Îranê vê gavê di bin hêla hejariyê de jiyana dîkin. Nirxa hêla hejariyê di bajarên mezin de serweyî 7 milyon tûmenî di heyvê de hatiye ragihandin. Eva di demekê de ye ku bi gotina rayedarên Îranê çend milyon kes jî di bin hêla bîrsîtiyê de dijîn û evdalê peydakirina pariyeke nanê rojêne. Eve di demekê de ye ku rejîmê di heyamê zêdetir jî 40 sal deshiladariya xwe de bi berdewam heyî û çavkaniyên welêt bitalan birine û ji şer û herwisa harîkariya girûpên terorîstî û teqandin û çêkirina şer û alozî di nava axa welatên herêmî de



kirye.

Bilindbûna rêjeya bêkarî û hejarî û bîrsîtiya xelkê Îranê ne ji ber vê yekê ye ku welatê wan hejar e û ti çavkaniyek xwezayî û dewlemendiyek nîne, belkî eve rayedar û rêveberên wî welatî e ku bi siyasetên dijîgelî yên xwe, serwet û heyîya welêt didizin û xesar dîkin û bo bernaneyên navokî û mûşekî û teyarkirina Spaha Qudis a terorîstî û Pasdaran û hêz û girûpên terorîstî yên girêdayê rejîmê ve terxan dîkin. Kiryar û siyasetên şerxwazane û pawanxwazî û terorîstî yên rejîma Îranê wisa kirye ku dorpêçên herî tund û berfireh bikevine ser aboriya Îranê û di vê navberê de jî civatgeha Îranê bi giştî dibe bîxwastîka xwe tawana siyasetên wê deshilata mafîya û dijî gelî bidin.

Ji aliyekî din ve, gendelî, dizî, “rîşwexwarin”, bitalanbirina bi hezaran milyar ji pere û samana xelkê Îranê bûye raştiye haşa jê nekirî ku rayedarên nîzamê neçar in bi xwe îşarê pê bikin. Her li gor Saziya Şefafiyet a Navdewletî, Îran di warê gendelî û dizî û geşesendina gendelî û fesadiya aborî di nava 180 welatên cîhanê de di rêza 138`emîn welatên cîhanê de ye. Di rastî de mirov dikare bêje ku rih û rîşeya gendelî, dizî, bi talanbirina serwet û heyîya welat û xelkê Îranê tevî rîşeya nîzama gendel a Komara Îslamî a Îranê bûye û nemana gendelî û dizî û doşîna serwet û heyîya welêt tê wateya nemana rejîma Îranê.

Nerîna Lîderan



“Elliott Abrams”:
“Emê dê di rojên bê de givaşên xwe li ser Îranê zêdetir û tundtir bikin”.



“Sergey Lavrov”:
“Pirsa Kurd di Rojhilata Navîn de pirseke micid e”.



“Jean-Yves Le Drian”:
“Tirkiye bi awayî leşkerî di şerê Qerebaxê de mudaxilê dike”.



“Hesen Rûhanî”:
“Rewşa aboriya Îranê ji rewşa aboriya welatê Almaniyayê baştir e”.

Artsax yan Qerebax, kîjan xwedî maf e?



N: Eskender Ceiferî

Nagorno Qerebax an Qerebaxa Jorîn an jî Komara Qerebaxa Çiyayî, wek Artsax jî tê naskirin, dewletek e ku di asta nevnêwî de bi fermî nêye naskirin. Li gor saziya Neteweyên Yekbûyî, ewder, perçeyek ji axa Azerbaycanê ye. Lê di rastî de ewder wek dewleta DEFACTO ji Azerbaycanê veqetiye ye.

Komara Nagorno Qerebaxê li başûr rojavaya Azerbaycanê ye. Ew li rojhelat bi Azerbaycanê re û li rojava jî bi Ermenîstanê re hevşînor e.

Ji danezanîna serxwebûna di 1991an vir ve, zimanê fermî yê Qerebaxê, Ermenî ye.

Tevî ku heşîmeta herî zêde ya vê navçeyê Ermenî ye û hinek Kurd jî li wir dijîn, lê di rastî de ne kesek piştî Kurdan digire ku ew li wir bibin xwedî maf û ne jî kesek bi êşkere piştî Ermenîyan digire. Saziya Neteweyên Yekbûyî ku weke saziya ji bo paraştina mafên neteweyan tê binavkirin, ji bo paraştina mafê Ermenîyan li wir tev nagere.

Rast e li wir şerê Kurdan nayê kirin lê belê şerê Ermenîyan û hemû wan pêkhat-eyan tê kirin ku li dijî serdestiya Azerbaycanê li wir tev digerin.

Mijar kûr dibe û di rojên derbasbûyî de Tirkiyê bi awayekî êşkere ragihand ku ewê li hemberî Ermenîstanê di eniya Azerbaycanê de bin heya tevahiya navçeyan jî destê Ermenîstanê yan jî wê dewletê derxînin ku tenê Ermenîsan li piştî wê ye.

Li gor serjimêriya herî dawî ya Ermenîsanê ku sala 2011an hatiye encamdan, li vî welatî bi giştî nêzîkî 38 hezar Kurdan dijîn ku ji 35

hezar kes ji wan re Êzidî tê gotin û ew 3 hezar kesên din jî wek Kurd hatine binavkirin.

Helbet tê gotin ku Ermenîstan jî qet li mafên Kurdan mikur nehatiye. Lê belê di vê navberê de pirtirbûna heşîmeta Ermenîyan li wê navçeyê, nîşan dide ku ew navçe, mafê Ermenîyan e. Ji xeynî hin gund û navçeyên biçûk ên Azerîyan, lê belê navçeyên din hemû yan jî pîranî Ermenî ne.

Li Azerbaycanê jî ji Kurdan re tê gotin Azerî. Li wir qet zimanê Kurdî bi fermî nehatiye naskirin.

Di vê navberê de hin welat jî hene ku dixwazin rewşê aram bikin. Wezîrê derve yê Amerîkayê Mike Pompeo ji rojnamevanan re ragehand, ku çekdarên Sûrî ji Lîbya re hatine veguheştin û ew bûye sedemê alozî, şer û kuştinên zêdetir.

Mike Pompeo Tirkiye hişyar kir û ragehand, şandina çekdarên Sûrî bo şerê navbera Ermenîstan û Azerbaycanê heman alozî û şer û kuştinên li Lîbyayê dê li wê navçeyê jî dubare bike.

Heftiya derbasbûyî Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirovan ragehand, heta naha hejmara çekdarên Sûrî li Azerbaycanê geheştîye 850 çekdaran û bendewarî hene hejmarekî zêdetir a çekdaran ji aliyê Tirkiyê ve bîn şandin.

Di şerê Azerbaycan û Ermenîstanê de bi dehan çekdarên Sûrî yên ku Tirkiyê ew şandine şerê Ermenîstanê, hatin kuştin.

Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirov ragihand, di 48 demjimêrên borî de, 36 çekdarên Sûrî yên ku Tirkiyê ew şandine eniya şer, hatine kuştin û bi dehan jî birîndar bûne.

Wê saziya sivîl da zanîn, bi giştî heta niha 64 çekdarên Sûrî li Qerebaxê hatine

kuştin.

Tirkiye ku di şerê Qerebaxê de piştevaniya Azerbaycanê de dike, hejmarek ji çekdarên opozîsyona Sûriyê tevî wî şerî kirin. Li gor zanayriyên Rewangehê, heta niha Tikriyê 1200 çekdarên Sûrî şandine şerê Qerebaxê.

Hevdem serokwezîrê Ermenîstanê Nikol Pashinyan roja yekşemê 27.09.2020an bang li civata navnetewî kir, da ku piştî rast bibin ku Tirkiye destê xwe nexwe nava nakokiyên di navbera wan û Azerbaycanê da li ser herêma Nagorno – Qarabaxê.

Ev hişdarî ya ji aliyê Serok hikûmetê Ermenîstanê ve di wî çaxî da hat, dema ku serê sibeya Yekşemê şer di navbera Ermenîstanê û Azerbaycanê da derketî û Tirkiyê piştevaniya xwe bo Azerbaycanê diyar kirî.

Balyozê Ermenîstanê li Moskowayê Fardan Taganyan jî, ji ajansa Sputnikê ya Rûsyayê re axivî û da zanîn Tirkiye 4 hezar komên çekdar ê Sûriyê bo şer li dijî Ermenîstanê bikin bo bereyên şer ê Azerbaycan û Ermenîstanê şandine.

Herwiha Fardan Taganyan tekez jî kiriye Tirkiye wan komên tûndrew ê Sûriyê perwerde kirine û dixwaze wan di şerê li dijî Ermenîstanê de bikarbîne.

Îranê helwesteke cuda hebû û tenê dixwaze berjewendiyên wê paraştî bin. Berdevkê Wezaretê Derve yê Îranê Seîd Xetîbzade roja dûşemê 05.10.2020an ragihand ew ketina topên hawênan bo ser sînorên xwe qebûl nakin.

Di kongreyeke rojnemewanî de Seîd Xetîbzade aşkere kir wan bo bi dawîbûna qeyrana Qerebaxê û bi dawîbûna şerê Azerbaycan û Ermenîstanê projeyek amade kiriye û di demeke nêzîk de wê Îran hem ligel herdu welatan û hem jî ligel welatên herêmê deşt bi danûstendî bike.

Lêvegera kurdî û destpêkirina ji sifir



N: Ebdulazîz Qasim

Piştî derbasbûna şeş salên nexweş û dijwar, piştî dagîrkirina Efrînê û Girêspî û Serêkaniyê ji aliyê dewleteke bihêz wekî Tirkîyê ve, piştî koçbarkirina zêdetir ji milyonek mirovên kurd ber bi welatên Ewropayê ber bi rêya çûn û nehatinê, rêya asîmîlasyonê ya jêre dibêjin “întegrasyon”, piştî zêdetir ji 20 hezar şehîd û birîndaran, piştî û piştî çî û çî ... careke din em vedigirin li ser xala sifir ya rêkkestinnameya Duhokê 2014-an!

Lêvegera kurdî, piştî şeş salên pir bi felaket û dijwar, careke din dikeve rojevê wekî pêdiviyeyeke netewî û dîrokî ji bo biryarê bide li ser qeder û çarenivîsa gelê kurd li Kurdiştana Sûriyê, ku niha amadekarî û danûstandin li ser damezrandina wê dibin û tê texmînkirin ku di demeke nêzik de were ragihandin.

Helbet tevî derengketina damezrandina desteya lêvegera Kurdî, lê hêj girîngiyeke wê ya mezin û dîrokî heye, û mîletê Kurd bi vê yekê careke din hêz û morala xwe distîne û geşbîn dibe.

Çîroka me gelekî dirêj kir, lê ya girîng ku ev çîrok ne wekî çîroka “Mem û Zînê” yan wekî ya “Xec û Siyamend” bi dawî bibe, nemaze ku tê pêşbînîkirin ku ev danûstandinên di navbera ENKS û PYNK de di demeke nêzik de wê bi dawî bibin, û li devera rojhilata Firatê, li pêşiya encamdana helbijartinên Amerîka, ku fedrasiyonek di navbera Kurd û Erebi û Xirîstîyan de dirûst bibe û tede Lêvegera Kurdî wê pêgeheke bihêz hebe, û “Fedrasiyon” wê bibe wekî “Sûriyayek Biçûk” û nemûneyek ji damezrandina Sûriyayek nû re, nemaze ku ev yek bi alîkariya Amerîka û rezamendiya Rûsya û heta bi bêdengiya rejîma Sûriyê jî dibe, bi tenê ku opozisyona ser bi Tirkîyê ve “îtîlaf” bi roleke herî xirab radibe.

Wekî em dizanin ku Lêvegera Kurdî wê bi feftî-feftî (pêncî-pêncî) di navbera ENKS û PYNK de were damezrandin, lê ya pêdivî ye ku ev Lêveger kar bike wek Lêvegereke yekgirtî li ser erdê û herwisa jî li ser maseyên danûstandinê çî li hindur û çî li derve û bi taybetî li Cenêvê, ku tevî girîngiya hebûna Lêvegera Kurdî û rêveberiyeyeke xwecihî li ser erdê, herwisa divê mafên



gelê Kurd li ser kaxezan di destûra nû ya Sûriyê de jî bêne pejirandin, jiber ku rewşa kurdiştana Sûriyê bi Sûriyayê ve girêdayî ye, û rewşa Sûriyê bi biryarên navdewletî ve girêdayî ye, nemaze biryara navnetewî 2254, lewra dibe ku ev danûstandinên kurdî-kurdî û herwisa kurdî-Erebî-Xirîstîyanî yên li rojhilatê Firatê dibin bibin faktor ji bo çareserkirina krîza Sûriyê, wek dibêjin ku di siyaseta de her tişt tê pêşbînîkirin, dibe ku felaket biqewmin herwisa dibe sîrprîz jî çêbibin, û divê Kurd bêhêvî nebin, û dewlet di şev û rojekî de ava nabin, û bila careke din em ji sifir destpê bikin, lê vê carê bi yekdeng û yekhelwestî.

“Mihemed Emîn Ebas” naskirî bi “Ebû Mizgîn” bi sedema vîrûsa Koronayê koça dawiyê kir

Pêka nûçeya ku ji aliyê malpera “RÛDAW”ê ve hatiye belavkitrin, Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Demokrat a Kurdistanê -Sûriye (PDK-S), “Mihemed Emîn Ebas” naskirî bi “Ebû Mizgîn” şeva derbasbûyî li dema veguhestin bo nexweşxaneyê bajarê Hewlêrê, di rê de bi sedema tûşbûn bi vîrûsa Koronayê canê xwe ji dest da.

Hacî Kalo, Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Demokrat a Kurdistanê-Sûriyê ji “RÛDAW”ê re got: “Mihemed Emîn” li roja Sêşemî ya heftiya derbasbûyî tûşî vîrûsa Koronayê bibû û di nexweşxaneyê Azadî ya



bajarê “Duhok”ê de hatibû razandin, lê piştî ku rewşa tendîrûstiya wî xirabtir bû, me xwest wî bi nexweşxaneyeyeke din li Hewlêrê veguhazin, lê li dema veguhestinê di rê de canê xwe ji dest da.”

Herwisa Hacî Kalo got: “Termê Mihemed Emîn niha di

Pizîşkiya Dadê di bajarê “Duhok”ê de ye û biryar e ku li roja Sêşemî di danê sibêzê de term wî radeştî malabta wî bikin.”

Pêka gotina “Hacî Kalo”, biryar e termê wî siyasethanê Kurd bo Rojavayê Kurdistanê bê veguhestin û li gundê Qaştepan a girêdayê bajarê Dêrikê, bi axê bê spartin.

“Mihemed Emîn Ebas”, tevî ku Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Demokrat a Kurdistan-Sûriyê bû, berpîrsê rêxistinên vî partiyê li Kampa “Domîz”ê jî bû.

Kasibkarekî Kurd yê xelkê bajarê Serdeştê hate birîndarkirin

Eêvareya roja Sêşemî 8ê Rezberê, kasibkarekî Kurd yê bi navê “Mehdî Resûlzade” xelkê gundê “Bûbane” a ser bi bajarê Serdeştê, bi teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetê li ser sînorê “Nokan” a ser bi wî bajarî hate birîndarkirin.

Ew kasbkarê Kurd bi bê agehdarkirina berê ji aliyê hêzên leşkerî yên hikûmetê ku li paygaha “Nokanê” cihgir bûn, teqe li navbirî kirin.

“Mehdî Resûlzade” di wê bûyerê de lingê wî birîndar bûye û bo tedawiya pizîşkî bo nexweşxaneya bajarê Serdeştê hate veguhaştin.



Çalakvanekî xelkê bajarê Merîwanê ji aliyê Polîsê Fetayê ve hate gazîkirin


Roja Sêşemî 8 Rezberê, “Aram Fethî”, çalakvanê medenî û xelkê bajarê Merîwanê ji rêya banghêjiyekê ve bo Polîsê Feta ya wî bajarî Hate gazîkirin.

Ew çalakvanê medenî di vê derheqê de ragihandiye: “Nêzî yek sal e ku ji ser dema belavkirina nûçeyê “zarok azarî” yê temen 7 salî ji aliyê mêrekî temen 60 salî ji bajarê Merîwanê re derbas dibe; piştî belavbûna wê nûçeyê li ser torên civakî, malbata “A.R” mêrê 60 salî li ser min sikala tomarkiriyê

û niha dixwezîn bi tohmata belavkirina nûçeya neraşt, dixwazîn digel min “Aram Fethî” lêkolîn û dadgehî bê kirin.

Li gor wê banghêjiyê, “Aram Fethî” dibê demjimêr 10 sibêdeha roja Pêncşemî 10 Rezberê, xwe bi Polîsê Fetayê re bide nasîn.

Xezelwera sala 1398`an, ew çalakvanê medenî li derheq destdirêjî bo ser zarokekê ji aliyê Polîsê Fetayê ve hatibû gazîkirin.



Ew çalakvanê medenî roja Şemî 14 Befranbar heman salî ji aliyê Saziya Îtîla`ata Spaha Pasdaran ve hatibû binçavkirin û piştî 4 rojan binçavkirin bi danîna barimteyê hatibû azadkirin.

Mamoştayekî olî bi barimteyê zêde ji girtîgrha bajarê Urmîyê hate azadkirin

Roja Duşemî 7 Rezberê, “Emîr Zikalab” pêjnîmêjê Înê yê gundê “Ermenîbilaq” a ser bi bajarê Bokanê, bi danîna barimteya 500 milyon tumenî heya dema dadgehîkirina wî ji girtîgehê hate azadkirin.

“Emîr Zikalab” rêkevtî 20 Gelawêja îsal ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin û di heyama binçavkirina xwe de ji “destpêragihîştina bi parêzer û çavpêkevtin digel malbata xwe” bê par bû.

Ji aliyekî din ve roja Duşemî



7 Rezberê, “Mê`irac Murtizayî” welatîyê Kurd yê xelkê gundê “Dêweznav” a ser bi bajarê Sewlava, bi danîna barimteya 40 milyon tumenî ji girtîgeha bajarê sineyê hate azadkirin.

Ew welatîyê Kurd roja Pêncşemî 9 Gelawêjê, piştî gazîkirin bo saziya Îtîla`ata Spaha Pasdaranê hatibû binçavkirin.

Rezoyê Osê di warê nivîsandin û helbestê de xwedî kedeke berçav bû

Li Rojavayê Kurdistanê Ebdilrezaqê Eliyê Îsayê Osê yan Rezoyê Osê di warê nivîsandin, helbest, wergeranî, rexnegirî, folklor û zimanê kurdî de xwedî kedeke berçav bû.

Rezoyê Osê hêviya xwe bi zarokan ve girê dida, lewra guh dida wêjeya zarok û biçûkên kurdan û hewl dida zimanê kurdî li ber dilê wan şêrîn bike. Ji bo vê yekê jî, Rezo gelek çîrokên gelêrî yên zarokan lêkolîn û çap kirin.

Rezo xwedî dilekî nazik û heştên bi coş û kelecana bû, lewma di warê helbestê de xwedî berhem bû û diwaneke helbestan bi navê “Kevoka min” li pey xwe hişt.

Navborî kurteçîrok jî dini-vîsandin ku li jêr navê “Civîna Pêlavan” belav bûn. Herwiha di warê rexnegiriyê de jî kar dikir, bi taybetî lêkolîna wî Uzunname.



Di qada rewşenbîriya Kurdî ya Binxetê de, Rezo giringiyeke mezin dida mijara zimanê kurdî jî. Wî ji deştêkê ve, li hundir û derveyî welêt, kursên fêrkirina zimanê kurdî ji keç û xortên Kurd re vedikirin, herwiha digot divê berî her tiştî em li zimanê xwe vegerin û hinekî li ser rawestin.

Gelek nivîskar û helbestvanên Kurd ên Binxetê, Rezoyê Osê di nivîs û helbestên xwe de bi bîr anîne.

Helbestvanê Kurd Ehmedê Huseynî bi navê “Deştên Rezoyê Osê” wiha li ser wî dibêje:

Ez li wir bûm

Li Dekşûriyê

Şevîstan radeştî şopa

Rêberan û radeştî silavên me dibû

Li Amedê

Birc û keleh di giriyê me de dixeniqîn

Li Hewlêrê

Deştên me di taya xatirxwestinê de pûç dibûn

Û li Qamişlokê

Bi hezaran qublename

Di çavên me de diteqiyan... RÛDAW

Şefîq Bavê Reid 45 salan şahî bi rêve birine

Hunermendê Kurd Şefîq Bavê Reid bi çêkirina tembûr, saz û baxlemeyan tenêtiya tarî dişikîne û debara jiyana xwe jî peyda dike.

Hunermend Şefîq ji temenê 14 salî ve tembûrê dijene, bi ştranên xurfanî deşt pê kir wek ştrana Emîna, Sînemê û Finciko û gelek ştranên din.

Hunermendê gelêrî Şefîq Bavê Reid ku sala hatiye ser rûyê dinyayê, 45 salan şahî bi rêve birine, dibe ku lingek li Rojavayê Kurdistanê nemabe ku li ber saz û dengê wî nehejiyabe.

Ew xelîfeyê hunermendê koçkirî yê Rojavayê Kurdistanê Yûsîfê Çelebî ye. Hemû ştranên Çelebî ezber kirine û wek parzêvanê berhemên wî tê naskirin. Çîroka Çelebî û serokê Sûriyê Hisnî el Zeîm dibêje, ew heya newqê sersam û aşiqê Çelebî ye.

Kurd dibêjin “Yek heye bi sedî, sed heye ne bi yekî”



Bavê Reid jî di dirêjahiya jiyana xwe ya hunerî de, bi tenê yek ştran çêkir, ştrana Edlayê kir kilîp, pir deng veda û li her çar parçeyên Kuridstanê li ser zar û zimanan geriya.

Niha hunermendê Kurd Şefîq Bavê Reid li bajarê Qamişlo yê Rojavayê Kurdistanê bi tena xwe di malekê de dijî û debara jiyana xwe bi karê sazkirina amûrên muzîkê dike. RÛDAW

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdiştanê de

Di 6 mehên yekem yê sala 1399'an a Rojî di Kurdiştana Îranê de 252 kes hatine binçavkirin

Pêka amarên tomarkirî di Navenda Amar a Saziya Mafê Mirov a "Kurdpa"ê, di heyamên wan 6 mehên yakem yê sala 1399an de, 252 welatî di Kurdiştana Îranê de hatine binçavkirin. 226 kes ji wan welatîyên binçavkirî di wî heyamî de, ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hatine binçavkirin

26 kes bo derbaskirina heyamê hepsa xwe hatine binçavkirin û veguhasîne girtîgehê.

Cudakirina amara jêrî bas ji 226 binçavkirinan li heyamê 6 mehên yekem di sala 1399an de dike.

Sedem û awayê binçavkirina welatîyan:

Binçavkirin ji aliyê hêzên ewlehiyê ve: 195 kes

Binçavkirin ji aliyê hêzên leşkerî ve: 26 kes

Binçavkirin ji aliyê hêzên kincşexsî ve: 1 kes

Nerohniya qeder û cihê ragirtina binçavkiriyan: 194 kes

Vekolîna malên welatîyan: 27 car

Êrîş û têkdana nav mal û xaniyên welatîyan: 46 car

Zevtkirina emrazên kesên yê welatîyan: 16 car

Lêdan, azardan û îşkenceya welatîyan ji aliyê hêzên ewlehiyê ve: 9 kes

Birîndarbûna welatîyan di dema binçavkirina wan de: 3 kes

Tohmetlêdan û sepandin li ser welatîyan di heyamê binçavkirinê de

Hevkarî digel Partiyên Kurdî:

31 kes

Kolberî û şikandina sînor: 8 kes

Çalakvanên Olî: 8 kes

Rexnegirtin li Komara Îslamî û berpîrsên hikûmetî: 7 kes

Çalakiyên Partiyên Kurdan di gundan de: 4 kes

Hilgirtina alaya Kurdiştanê: 3 kes

Beşdarî di rêûresma biaxspartina qurbanîyên meha Xezelwerê: 2 kes

Tohmetên ewlehiyê: 1 kes

Belavkirina nûçeyên pêwendîdar belavbûna vîrûsa Koronayê: 1 kes

Hevkarîkirin digel hepsiyên revî yê girtîgeha Seqizê: 1 kes

Rêgirî ji birêveçûna rêûresma canjidestdana jîngeparêzan: 1 kes

Beşdarbûn di rêûresma canjidestdana jîngeparêzan: 2 kes

Bêrêzî bi behayan: 1 kes
Banghêjî bo kombûna nerizayetî di torên civakî de: 1 kes
Rexne ji rewşa xirab a aborî û hukmê îdamkirina 3 ciwanên nerazî: 1 kes

Şerê devkî derheq pîrsa tevgera Kurdiştanê digel yek ji berpîrsên padigan: 1 kes

Guherîna Ol: 2 kes

Kasibkar li ser sînoran: 3 kes

Pişikdarî di kombûnên nerizayetî di beramber balyozxaneyên Azerbaycanê de: 2 kes

Aliyê Çalakiya hejmarek ji wan kesane hatiye rohnkirin:

Çalakvanên olî yê Sunî mezheban: 16 kes

Çalakvanên medenî: 13 kes

Kolber: 8 kes

Çalakvanên jîngeparêzî: 4

kes

Çalakvanên torên civakî: 4 kes

Rojnamevan: 4 kes

Lêkoler û nivîser: 3 kes

Parêzer: 3 kes

Endamê Mekteb Quran: 3 kes

Serbaz: 3 kes

Endamên şwraya gundan: 3 kes

Kasibkar: 3 kes

Çiyager: 2 kes

Guherîna Ol: 2 kes

Werzişvan: 1 kes

Hunermendî û Jenyarî: 1 kes

Çalakvanê mafê mirovan: 1 kes

Endamê Bereya Yekgirtiya Kurd: 1 kes

Hunermend: 1 kes

Nûçegihanê deng û rengê komara Îslamî: 1 kes

Navenda Amar ya Saziya Ajansa Mafê Mirov a "Kurdpa"

Amadekarî ji aliyê: Evîn Miştefazade

Hevkarî digel Partiyên Kurdî: 31 kes

Kolberî û şikandina sînor: 8 kes

Çalakvanên Olî: 8 kes

Rexnegirtin ji Komara Îslamî û berpîrsên hikûmetî: 7 kes

Çalakiyên Partiyên Kurdan di gundan de: 4 kes

Hilgirtina alaya Kurdiştanê: 3 kes

Beşdarî di rêûresma biaxspartina qurbanîyên meha Xezelwerê: 2 kes

Tohmetên ewlehiyê: 1 kes

Belavkirina nûçeyên pêwendîdar belavbûna vîrûsa Koronayê: 1 kes

Hevkarîkirin digel hepsiyên revî yê girtîgeha Seqizê: 1 kes

Rêgirî ji birêveçûna rêûresma canjidestdana jîngeparêzan: 1 kes

Beşdarbûn di rêûresma canjidestdana jîngeparêzan: 2 kes

Bêrêzî bi behayan: 1 kes
Banghêjî bo kombûna nerizayetî di torên civakî de: 1 kes
Rexne ji rewşa xirab a aborî û hukmê îdamkirina 3 ciwanên nerazî: 1 kes

Şerê devkî derheq pîrsa tevgera Kurdiştanê digel yek ji berpîrsên padigan: 1 kes
Guherîna Ol: 2 kes

Kasibkar li ser sînoran: 3 kes
Pişikdarî di kombûnên nerizayetî di beramber balyozxaneyên Azerbaycanê de: 2 kes
Aliyê Çalakiya hejmarek ji wan kesane hatiye rohnkirin: Çalakvanên olî yê Sunî mezheban: 16 kes

Çalakvanên medenî: 13 kes
Kolber: 8 kes
Çalakvanên jîngeparêzî: 4 kes

Çalakvanên torên civakî: 4 kes

Rojnamevan: 4 kes
Lêkoler û nivîser: 3 kes
Parêzer: 3 kes
Endamê Mekteb Quran: 3 kes
Serbaz: 3 kes
Endamên şwraya gundan: 3 kes

Kasibkar: 3 kes
Çiyager: 2 kes
Guherîna Ol: 2 kes
Werzişvan: 1 kes
Hunermendî û Jenyarî: 1 kes
Çalakvanê mafê mirovan: 1 kes
Endamê Bereya Yekgirtiya Kurd: 1 kes
Hunermend: 1 kes
Nûçegihanê deng û rengê komara Îslamî: 1 kes

Navenda Amar ya Saziya Ajansa Mafê Mirov a "Kurdpa"yê

Wêneyên bi dawîhatina dewreya destpêkî ya 244

